

Êdî Almaniya li
hemberî Îslama Si-
yasî bêdeng namîne

»»» R:7



Hepsiyên siyasî û
siyaseta hepsê di Îranê
de

»»» R:4



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (385) 07-11-2020 Buha (1000) Tûmen

Rengvedana hizra te-
vahîxwaziyê li ser kesayetiya
Kurdî

»»» R:5



Kurd û
Fransa

»»» R:8



Xala dijberê Tehranê

Hilbijartina Sero-
katiya Amerîkayê
roja Yekşemî rêketa
13-ê Xezelwerê dawî pê
hat û hejmartina den-
gan hatiye destpêkirin,
lê heta dema amade-
bûna wê raporê encama
dawî nehatiye ragi-
handin ku kîjan yek ji
berbijêran dibe 46-emîn
serokê Amerîkayê.

Herdu berbijêrên Se-
rokayetiya Amerîkayê
çavniherê serkevtinê
dikin, lê pêşbirkê
gelek heştiyar e. Li hin
ji wilayetan de “Don-
ald Trump” li pêş e, û
li hin wilayetan de jî
“Joe Biden” li pêş e.
“Donald Trump” Ber-
bijêrê Komarîxwazan
xatircem e ku di vê hil-
bijartinê de serdikeve.
Lê “Joe Biden” basa
vê yekê dike ku deng
diyarî dikin ku kî li
ser korsiyê Koşka Spî
dirûnê.

Her li naveroka he-
jmartina dangan û pêş
vê ku encama dawî bê
ragihandin, her yek
ji “Donald Trump” û
“Joe Biden” pîrozbahî
li alîgirên xwe kirin, û
mizgîniya serkevtina
xwe ragihandin. Heta
kempeyna bangeşeyê
ya “Trump” basa vê
yekê kiriye ku di çend
herêman de destkarî
li hejmartina dangan
hatiye kirin.
Di hilbijartina îsal de

214 milyon hevvelatîyên Amerîkayî mafê dengdanê hene, ku ji wê rêjeyê, zêdetir ji 160 milyon kes
beşdar bûn. Bi gelemperî 50 herêm tevî devera “Washington”ê xwediyê 538 dengê “electoral” in, û her
yek ji wan du berbijêran bikarin 270 “electoral” bi dest bînin, serkevtinê bi dest tînin.

Digel vê yekê jî Amerîka di cîhanê de teke welat e ku piştî vê ku berbijêrê Serkomarî bi piraniya
dengên hevvelatîyan hilbijartinê dibe, lê hêj nikare bibe Serkomarê Amerîka, çimkî Serkomar ji rêya
dengê “Encûmena Hilbijartinê” ve tê hilbijartin, ne ji riya dengê raştewxwe yên xelkê.
Hilbijartinên Amerîkayê bandorê li ser beşeke berçav ji welatên cîhanê û nemaze Îranê dadinê, û her



di wê derheqê de herçend seranên payebilind yên rejîmê gotine, bo wan girîng nîne ku encama hilbi-
jartinê dibe çi, lê kesê bawerî bi axavtinên wan nîne, û hemû dizanin ku bi çi nigeraniyerê ve mîzeyî
wê pirsê dikin! Ji vê zêdetir Hesên Rûhanî gotiye: “Dewleta bê ya Amerîkayê li hember daxwazên me
de, wê xwe radeşt bike! Eva jî di demekê de ye ku li serdemê serokayetiya “Donald Trump” de Kom-
ara Îslamî raştî rewşeke gelek aloz hat ku vê aloziyê tev cumgeyên desthilata Tehranê hatiye li xwe girt,
û di gelek waran de, ji wan warê aborî û siyasî qedemên wê şikandin ku bandor li ser biyavên jiyanê jî
danî, û rewayeta xeyalî ya Tehranê hindiyî din raştî pirsyarê kir, bi awayekî ku niha çi li asta navxweyî
û çi li asta derve de, Komara Îslamî ber bi jinavçûn û herifînê diçe.

Herçiqas ku Tehranê dilê xwe bi vê yekê xweş kiriye ku bi danganîna “Joe Biden” dawî bi jiyana wê
ya tal tê, û dikare kontorola rewşa niha bike, lê şiroverkaran û karnasên karûbarê Îranê wisa dizanin
ku ti cudahiyeke wisa di warê stratîjiyê de li navbera “Trump û Joe Biden” an siyasîmedarên din yên
Amerîkayî de nîne, çimkî di xalên bingeîn de peyrewî ji yek eslê dikin, ev jî pêk hatiye ji serweriya
welatê wan, û ew tev siyasîetên xwe li ser bingeha berjewendiya xelkê xwe dadirêjin. Eva jî rêk xala
berevajiyê Tehranê ye!

Sergotar

Kurd û Amerîka

N: Kerîm Perwîzî

Li du rojên borî de ku hîlbijartina serokatîyê li Amerîkayê bi rê ve çû, tevî gellek bas û mijarên siyasî ku di vê derheqê de têne gorê, cardin baseke din jî serî hilda, ku ger Trump cardin bibe serkomar ji bo Kurdan baş e, yan Bayden zêdetir wê berjewendiya Kurdan berçav bigre.

Li gora giranî û rola Amerîkayê di siyaseta aborî û peywendî û balan-sên leşkerî di cîhanê de, tu welatek û renga tu hizbek di cîhanê de tunebe ku li hem-ber hîlbijartina serokatîyê li Amerîkayê bêdeng û bêheşti-yar be, û guh lê nebe ku çi diqewime.

Lê li herêmeke aloz wekî Rojhelata Navîn de, ew heştîyariya gellek zortir e û danganîna her yek ji wan berbijêran di serokatîya Amerîkayê de, aliyê kêr li ser jiyana siyasî û aborî a wan bandorê dadinê, ger em nebêjin bandoreke çarenûs-saz dadinê!

Lê Kurd di vê hevkeşeya siyasî de ji kîjan alî qazanc dike, yan ji kîjan alî xisarê dibîne, bi hûdekariyeke zêde ve zelal nine, jiber ku Kurd li çar welatan e, û her yek ji wan welatan derheqê Amerîkayê de lênihêrîna tay-bet bi xwe hene, û dûrî yan nêzîkatîya Kurd bi her yek ji wan berbijêran dibe sedema qazanc û xisara ji berbijêrê dijber!

Bo mînak li Tirkîyê ger deshîlata hakim nêzîk li Trump be, û hez bike ku ew dangan bîne, wê demê Kurd-ên dijberî hikûmeta Tirkîye hez dikin ku Baydin dangan bîne, yan li Îranê ku

Navenda Hevkarî: “Celal Melekşa” bi sedema azadîxwazî û nivîsînê xwe hezkiriyê tev xelkê Kurdistanê bû



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê bi hilkefta koça dawî ya mamoste “Celal Melekşa” peyamek belav kir.

Peyam wiha ye:

Mixabin roja 10`ê Xezelwerê, “Celal Melekşa”, Helbestvanê bi helwest û azadîxwz ê Kurd li temenê 69 saliyê de bi sedema sekîna dil li bajarê Sineyê malavayî li jiyane kir.

“Celal Melekşa” ku her di serdemê paşayeti de bi sedema bîra azadîxwaziya wî heyamekê hatibû girtin û di girtîgehê de bû, li serdemê serhildan û piştî hatina ser kar a Komara Îslamî jî bi helbestên şoreşvanî û hemasî, bû xweragirê xelkê Kurdistanê û beranber bi rejîma Komara Îslamî navûbangê xwe der kir û helbestên xwe bo xebat û pêşmerge vedihûnand û li ser zarê xelkê bûn.

“Celal Melekşa” bi sedema şarezayî li wêjeya Kurdî û Farsî Endamê Kanûna Nivîserên Îran bû. Wî ku tev temenê xwe li jêr givaşa rejîmê de bûye û di rewşeke dijwar de derbas kir, lê qet netirsiya û bi sedema azadîxwazî û nivîsîn xwe ve hezkiriyê tev xelkê Kurdistanê bû.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê bi wê hilkeftê sersaxiya xwe arasteyê malbat û kesûkarê “Celal Melekşa” û Civaka Edebiyan û helbestvanên Kurd û xelkê bajarê Sineya qehri-man û tev Kurdistanê dike.

Nav û yada “Celal Melekşa” bo hetahetayî li bîr û hizra hemû xelk û tevgerta rewa ya Kurdis-tanê de bi zîndî dimîne.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê

11`ê Xezelwer a 1399`an a Rojî

1`ê Çirriya Paşîn a 2020`an

Trump zexteke zêdetir bo rejîmê aniye û Welîyê Feqîh hez dike ku hindî zûtir Trump bar bike û here, Kurdên dijberî rejîma Tehranê hez dikin ku Trump dangan bîne.

Lê faktoreke zor girîng heye ku nabe em ji bîr bikin, ku herçend gellek caran tê gotin ku siyaseta stratejîk ya Amerîkayê li gora partiyên Komarî yan Demokrat nahê diyarîkirin û navendeke taybetî- tir heye ku ji wir stratejî tê berhevanîn, lê kirdara taktîkî ya her yek ji wan partiyên Komarî û De-mokrt li ser me dibin biryareke çarenûssaz, bi vê watayê ku eva ji bo wan taktîk e, li ser me stratejî ye, û di vê navberê de çi Komarî yan Demokrat li ser kar be, her yek ji wan taktîk û şewaza xwe ya cuda bo siyasethîkirinê hene, û emê Kurd ê Rohilatê Kurdistanê jî divêt ku hewl bidin ku di nava taktîk û şewazên cuda de berjewendiya xwe ya neteweyî bibînin û destnîşan bikin, jiber ku xebat û siyaseta bi lojîk û hûrbînî tê kirin, nek bi pê xweşbûn yan hezkirin.

Mîstefa Hicrî: “Celal Melekşa helbest kiribû çepera nîştimanê”



Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta koça dawî ya helbetvanê gelê Kurd Mamosta “Celal Melekşa” peyama hevxiyê belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Peyama Hevxiyê

Mixabin mirineke necih di wê Payîzê de, mezinekî din ji gelê me şand, helbestvanê xwedî helwest û netewî, “Celal Melekşa” roja Şemî çû ser dîlovaniya xwe û herçiqas ku bi ceste niha di nav xelkê de nemaye, lê helbestên wî wekî kela welatpeweriyê û bi berdewamî û hertim zindî di hundirê dilê gel de ye.

“Celal Melekşa” helbest kiribûne çepera nîştiman û peyv kiribûne bi çek bona dijatiya dujminan û bi rastî gel pir ji wî hez dikirin û bona koça dawîya wî daxdar in.

Bi hilkefta koça dawî ya helbestvanê nîştimanperwer û netewî, “Celal Melekşa”, em sersaxiyê didin malbat, kesûkar û tev civaka wêjeyî ya Kurdistan û tev welatperwerên Kurd.

Riha wî şad û bîr û yada wî bi bilindî û hertimî be

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê


Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

11'ê Xezelwer a 1399'an a Rojî

1'ê Çirriya Paşîn a 2020'an

Mîstefa Hicrî bi hilkefta cejna “Xawenkar” peyamek belav kir



Lêpirsyarê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, “Mîstefa Hicrî”, bi hilkefta cejna “Xawenkar” a Ola “Yarisan” peyamek belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Nexweşiya Korona cejna “Xawenkar” jî guherî û mixabin rê neda ku hevînîştimaniyên me yên Kurd pêka Ola Yarî, cejna xwe di cihê xwe yên pîroz de lidar bixin.

Tevî pîrozbahiya rêûresma taybet bi wê cejnê ku di rojên derbasbûyî de hatine lidarxistin û roja cejna dawîya wê, li tev peyrewên Ola Yarî û li tev Yarisanên hevînîştimaniyên me, em hêvaxwazî ku nexweşî û nehametî li ser Kurdistanê me dûr bikeve da ku tev hevînîştimanên me bi aşî û aramî bijîn û yad û boneyên xwe yên pîroz lidar bixin.

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ

Mîstefa Hicrî

11'ê Xezelwer a 1399'an a Rojî

1'ê Çirriya Paşîn a 2020'an

Peyama Mîstefa Hicrî bi hilkefta koça dawî ya Dr. Necmedîn Kerîm

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ bi hilkefta koça dawî ya Dr. “Necmedîn Kerîm” peyama hevxiyê belav kir.

Deqa peyamê wiha ye:

Em hatine agehdarkirin ku têkoşerê berê yê xebata Kurdayetî û Endamê Berê yê Mekteba Siyasî ya YNK, Dr. “Necmedîn Kerîm” li roja Înê 30ê Çirriya Pêşîn di nexweşxaneyêke Amerîkayê de, koça dawiyê kiriye.

Dr. “Necmedîn Kerîm” li

qonaxê heştîyar, Parêzgarê Kerkûkê bû û her li despêkê alaya Kurdistanê li ser Parêzgariya Kerkûkê bilind kir.

Tevî xebateke dûrûdirêj ya Dr. “Necmedîn Kerîm” li doza rizgariya Kurdistanê, hevelekî kevnar û bi emeg yê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bû.

Bi wê hilkeftê, em sersaxiyê pêşkêşê hemû endamên malbat, kesûkarên Xwedêjêrazî û tev hogirên serbestiya Kurdistanê dikin û xwe bi şîrîkê xema wan dizanin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Lêpirsyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

31ê Çirriya Pêşîn a 2020

Hepsiyên siyasî û siyaseta hepsê di Îranê de



N: Serbest Urmîye

Di berê de dema ku qala heps yan zîndanê tê kirin, di hizra meriv de wêneyek ji odeyeke tarî tê heştkirin ku têde girtiyeke bi deştên kelepçe û pêyên qeydkirî di bin zexta zalim yan hikûmeta hakim de hatiye hepiskirin. Helbet eva ne wateya şaşiya hizra meriv e, hekî ku meriv di welateke weke Îranê, nemaze Îrana di bin deşthilata rejîma Îslamî de bijî. Di raştî de jî hekî meriv guhdarî serpêhatiya girtiyan, bi xasmanî girtiyeke siyasî di zîndanên Îranê de be, bêguman wêneyê ku hizra meriv neqîşandiye, raşt e.

Zîndan di yasaya Komara Îslamî ya Îranê de


Li gor maddeya 3an li beşa yekem a pêrewa navenda rêkxistina zîndanên Îranê, zîndan cihek e ji bo girtiyeke ku hikmê wan ji aliye dezgehên girêdayî bi deşthilata dadweriyê ve hatiye eşkerekirin, bo derbaskirina heyamê cezayê deştînkirî li gor tawana wan, bi merema elimandin û perwerdekirina girtiyan. Di heman pêrewê de û di beşa 2an de, berpirsiyar û rayedarên zîndanên erkdar hatine kirin ku hemû hewila wan ji bo perwerde û dabînkirina îmkanatên perwerdeya zîndanîyan be, nemaze di warên teknîkî, civakî, pêşesazî û... hwd de. Lê di raştî de ev yasa jî weke hemû yasayên din ên rejîmê, tenê li ser rûpelên kaxeze ne. bi xasmanî dema ku girtî, girtiyeke siyasî anku li gor yasa wan dijberî hizra û sîstema deşthilatdariya Îslamî ya wan be,

ya ku heya niha ji reftar yan em bêjin siyasatên rejîmê di derheq girtiyeke siyasî de hatiye dîtin û tecrûbekirin

wiha bûye:

-deştirêjiya cinsîn(sêksî): Her di deştirêjê de heya niha jî didome û weke pîroziyeke olê xwe didin zanîn. Bi awayekê ku mela û zanayên olî weke “Misbah Yezdî” di bersiva pirsîyarên rojnameya “Kêyhan” a wê demê de û li gor şerî`etê Îslamê û mesebê Şî`e, helal dizane ku ji bo wergirtina îtrafan ji girtiyeke siyasî, deştirêjiya sêksî were kirin û dibe ku pêşde deştînimêj were girtin. Herwiha dibêje ku xêra deştirêjiyê bi ser keçeka ne zevicî de ku dibe were îdamkirin, weke xêra çûna hecê ye û heke hikmê îdame jî wernegirtibe, xêra çûna Kerbelayê heye. “Misbah Yezdî” dibêje ku ji bo deştirêjiyê bi ser keç û jinan de, divêt ku kesê ku îtrfê jê werdigire tenê di jor de be, lê heke girtî mêr be, dibe ku xencî wergirê îtrafê kesên din jî hebin. Di raştî de siyaseta han dibe sedem ku kesayetiya civakî û menewî ya girtiyan were şikandin, bi terzekê ku êdî girtî heke serbest jî were berdan ji civakê were xewlekirin û tevli çî çalakiyên dijî rejîmê nebe.

- Siyaseta tewbekirinê: Siyaseta tewbekirinê yek ji wan siyasatên rejîmê derheq girtiyeke siyasî



ye ku di bin îşkence û zextê de, girtiyeke siyasî neçar tînin kirin ji derbasbûya xwe poşman bibe û di hevdtîninê rojnamevanî û televîzyonan de poşmaniya xwe ji xebata siyasî û wefadariya xwe bi sîstema Komara Îslamî re ragihîne û di heman demê de jî amade be li dijî hemû aliyeke siyasî û bi xasmanî aliyeke siyasî yê ku berê têde endam bûye, bisekine û berevaniyê li rejîmê bike. Ji bilî îtfarêfê, kesê ku tewbe kiribû neçar dikirin ku di zîndanên rejîmê de tevli sîstema îşkenceya zîndanîyan din ên siyasî bibe û heta di dema îdamkirina girtiyeke siyasî de û dema lêdana gulleyê dawiyê di dema gullebarankirina girtiyan de jî dihat bikaranîn. Herwiha di warên din ên sîstema serkutkirinê ya rejîmê de jî neçar bû ku çalakî hebe. Wate ji bilî jêwergirtina şûnasa hizrî, rejîm hewilê dide ku ji aliye çandî û civakî de jî şûnasa kesên tewbe kirî jî aloz bike.

- Siyaseta barimte girtinê: Berevajî yasaya cezaê Îslamî ya rejîmê ku têde hatiye ku ceza takekesî ye û dibe tenê li ser tawanbar de were cîbicîkirin û nabe di cihê kesê/a tawanbar de, kesên nêzîk yan malbata wî/ê ceza werin dayîn, lê di esil de yasaya han derheq girtiyeke siyasî de bi rê ve naçe û ya heta niha hatiye kirin zext û givaş bûye li ser malbatên girtiyeke siyasî û pirr caran jî kesên nêzîk an endamek ji malbata tometdarên siyasî ji aliye rejîmê ve bi barimteyê hatiye girtin, da ku weke alavê zextê mifah jê were wergirtin, heya ku kesê bertomet xwe radeştî rejîmê bike.

Siyaseta zextê li ser girtiyeke siyasî û malbatên wan: Tometdarên dosiyeyên siyasî di Îranê de her di dema girtîgehê de heya hikim tînin dayîn û dikevin girtîxaneyên rejîmê, hertim di bin zext û îşkenceyan de ne. Ti yek li eslên yasayê li derheq wan nahên berçav girtin û bi kurtî girtiyeke siyasî di sîstema rejîmê de weke gemar tînin mîzekirin ku hêjayî hemû îşkence û reftarên hovane ne. Li gor vê siyasatê jî, deştî dezgehên dadwerî û ewlekariyê yên rejîmê vala hatiye kirin ku reftar û kiriyarên wan li hember girtiyeke siyasî de hovane û li dijî sinc û exlaqên mirovahiyê bin.

Di sîstema dadweriya Îranê de xencî ku girtiyeke siyasî tînin îşkence kirin, malbat û nemaze zarokên wan jî hertim ber reftarên hovane yên dezgehên ewlekariyê dikevin. Ji bilî pîrsgirêkên yasaî û îşkenceyan, rejîmê hertim hewil daye ku di rêya dîrxistina girtiyeke siyasî û şandina wan bo zîndanên bajarên dûr, bê agahîhiştina malbatên wan li çarenivîsa wan û aştengkirina hevdtîna girtiyan bi malbatên wan re, pîrsgirêkên derûnî û aborî û... hwd jî ji girtiyan û malbatên wan re zêde bike.

Rengvedana hizra tevahîxwaziye li ser kesayetiya Kurdî



N: Sabrî Resûl

W: Ebdulezîz Qasim

Bi dirêjahiya dîrokê, her ji serdestiya Ereban û belavbûna Îslamê li Kurdiştanê û heta niha, hizrên tevahîxwaz “totalîter” li ser hizra Kurdî zal bûne û nehiştine çi hizrên cuda derkevin holê, yan jî peyda bibin û pêş bikevin, heta dikarin bêjin ku hizra netewî ya ku di nav Fars, Ereb û Tirkan de peyda bûyî, li ser koka ola îslamê peyda bû û wekî hespekî komêt ji bo avakirina saziyên xwe yên siyasî û jêrxana darayî bi kar anîn.

Hevdem ku peydabûna nakokiyên milî “populîst” di nava civakan de, her ji deşt-pêka belavbûna ola îslamî, vê yekê dupat dike, û ew yek ji sedemên lawaziya “Xîlafetê” di serdemên Emewî, Ebasî û Osmaniyan de bû, lê tevî wiha jî îslam ji aliyê xelkên din ve wekî Hespê Tirwade “Trojans” hate bikaranîn ji bo derbas bibin di kûrahiya civaka Kurdî de, û di vê yekê de serkevtin û sûd ji sadeyî û raştgoya mirovê Kurd girtin û deştê xwe danîn li ser hêza wî, û piraniya caran baweriya wî bi îslamê ji aliyên wan ve wekî “şûr û mertal” ji bo kontrolkirina gelê Kurd û Kurdiştanê hatiye bikaranîn, û mirovê Kurd kesayetî, taybetmendî, ziman û çanda xwe ji deşt daye, bûye kopî, sîber ji dagîrkeran re û alavêk di deştên wan de; bi vî rengî mirovê Kurd bû peya û pehlewana ji xelkê din re, dergêhvanê dergêhên padîşah û xelîfeyan, û çi carî hewl nedaye bi Kurdîtiya xwe

bifikire û di bin sîbera îslamê de jî nehate parastin, tevî ku oldarî danî li pêş netewperistiyê, lê herwisa jî ne karî ji zordestan û ne jî ji bindestiyê olî û siyasî rizgar bibe, û bi tenê bi oldariyê ve xwe girêda, û tîkiliya Kurdan bi hizrên tevahîxwaz, digel îslamî bi dirêjahiya çardeh sedsalan, û digel komunîstiyê di nut salên dawiyê de berde-wam kir.

Mirovê Kurd bi rêya van herdu hizrên serdest “îdolojî”, hêzeke mezin ji bo berjewendiya hizrên totalîterîzm ji deşt da, ku dîroka gelê Kurd wekî komek ji bûyerên malwêran yên siyasî û leşkerî ne ji hêla rejimên serdest ve hatine pêkanîn, Kurd qonax qonax ji malwêraniyekê ber bi malwêraniyeke din çûne û her bi vî rengî bi tenê bêhêvî bûne û şikestin para wan bûye, di encamê de tûşî şerên psîkolojî û leşkerî û talankirina çand û zimanê xwe bûye. Gotina “komek ji bûyerên malwêran”, balê dikişîne ku ji aliyê Kurdan ve ew bûyer ji aliyê dîrokî ve, wekî lîkolîn û xuyakirina sedemên derketina wan wekî werçerxan di jiyana wan de nehatine şirovekirin, û ders ji encamên wan nehatine girtin, ku bûyer bi tenê bi navên helkeftên dîrokî hatine nivîsandin, û Kurdan dîroka xwe li gorî heza xelkê din “hebûna Kurdan divê çawa be” û ne jî “hebûna xwe wekî heyî” nivîsandiye, bi vî awayî li ser deştê xelkê din dîroka Kurdî hatiye şewandin û berevajîkirin, û bi sextkarî bûyer hatine nivîsandin, tiştên neqewimî hatine zêde kirin û hin yên qewimî hatine veşartin, da ku Kurd nebin xwedan dîrokekî rast.

Kurdan nekariye bi xwendineke kûr bûyerên dîrokî li gorî pêşhatên siyasî û şert û mercên wan bixwînin, ku ew bi tenê di rojîmêran de û di lîsteya helkeft û ahengan de “car bi navê serkevtinan û car bi navê şikestinan” hatine tomarkirin, ku Kurdan sûd ji wan bûyeran negirtine ji ber ku nehatine nirxandin, û



pend û ders ji wan nehatine wergirtin, lewra ku dibe ew bûyer (yên trajîk) dubare bibin, yên ku dijmin sûd ji wan werdigirin û Kurd dimînin qurbanên wê yên bêserûşûn, ku Kurdan hin şewazên ahenggêranan ji zordestan werdigirin û semayê dîkin li ser laşên qurbanîyan û festîvalên serkevtinê lidar dixin yên tîkîşkestinên hatine amadekirin di nav korîdorên veşartî de, bi hinceta “bilindkirina moralên” winda, ji aliyê gelek tîman ve hin diruşm û peyv û zarav tene pêşniyarkirin, ku li hember şirovekirin û tîgihiştina wan siyasetmedar û hizrvan mat dimînin, û di demeke kurt de ew diruşm li ber bayê dikevin, careke din ji aliyê wan tîman ve hin alternatîfên din tene pêşniyarkirin, lawên Kurdan ber bi meydanên şehadetê dibin ji bo pêkanîna diruşmeke din ya ku ew jî wekî diruşmên berî xwe di demeke kurt de ji holê winda dibin. Li serdema Emewîyan, Ebbasî û Osmaniyan, ji aliyê Xelîfeyan ve gelê Kurd wekî ardûyê şer dihat bikaranîn, wekî embarek mirovî û yedek ji bo artêş û şervanên xwe, di pêşiya eniyên şeran de wekî mertal dihatin bikaranîn, ji bo ku bêtir erd, xenîmet û serkevtiyên mezin bi deşt bînin, lê ew serkevtin bi serkevtinên dîrokî bi navên padîşahan dihatin nivîsandin, ku heta niha em li dibîştanan, sirûd û waneyên bi wan û bi wan serkevtinan dixwînin, û şehiyê bi wan digêrin û kul û birînen xwe diveşêrin.

Di serdema çêbûna dewlet-

netewî de, nemaze piştî şerê duyem yê cîhanî, ji bo pratîkkirina tepeseriyê û qorixkirina mafên mirovan hemû alav ji aliyê rejimên otorîter yên dagîrkerên Kurdiştanê ve hatin pêkanîn, tevî peyrewkirina stratejiyeye zelal û projeyên siyasî ji bo ewê ku pêşiya kurdan di warên siyasî, civakî û aborî de bigrin. Li welatê me yê şewitandî (Sûriya), komek mafyaya siyasî heye û deştê xwe daniye ser erd û ezmanê wê, ji zeytûnê wê bigire heta pembûyê wê, û ji behrê bigire heta genimê wê, û hemû sînorên exlaqî û yasayî li ser deştê vê koma mafyayî hatine bînpêkirin, û bi taybetî li dijî gelê Kurd li Sûriya, siyasetên sîstematîk hatine sepandin, ku gelê me herdem di tirsê de jiyaye û gelên din heşt bi tirsê gelê Kurd nekiriye, herwiha ku dixwazin Kurd bi Erebişxwaziya wan pabend bibe wekî perçeyek ji totalîterîzma Îslamîk.

Belê, xelkê Sûriyê ji hêla rewşenbîrî û siyasî ve tene cewsandin, û azadiyên wan li gorî xwesteka deştîlatdaran hatiye sînordarkirin, lê gelê Kurd ji bilî vê jî, ji hêla netewî û çandî ve tene çewisandin, ne tenê ji aliyê deştîlatdaran ve, lê herwiha jî ji aliyê xelkê Sûriyê bêtir tene çewsandin, ku ev bac û bihayê dilsoziya mirovê Kurd e bi hizra totalîterîzmê re, bi vî rengî hemwelatîyên Sûrî, yên ku ji aliyê rejîmê ve hatinî tepeserkirin, ew jî dibne zalim û şemkar li ser serê mirovê Kurd.

Dengbêj û Şoreşgerekî Rojhilatî: Xalê Birê

N: Occo Mahabad

Rojhilat bi dengbêj û huner-mendên xwe cihekî dewlemend e. Dengbêjên Rojhilatê Kurdistanê gund bi gund, mal bi mal digerin dilê civatê bi klamên xwe xweş dikin. Di dewra Feodal de dengbêjên Kurd zêdetirîn di qesr û qonaxên mîr, beg û axayan de marîfeta hunera xwe nîşanî civatê didan. Bi pêşveçûna pergala kapîtal di roja me de rewşa dengbêjan û dengbêjiyê gellekî guheriye, şêwe û şikleke nû bi xwe ve girtiye. Îro rojê dengbêjên herêmê zêdetirîn di malên dewlemendan an jî niştecihên lê jiyayî de deng e xwe belav dikin li ser guhdarên xwe. Divê em ji bîr nekin ku dengbêj neynika civatê ne û di wêjeya devkî de xwedî cihekî girîng in. Pirr çîrok, destan û serpehatiyên dîrokî bi deng û keda wan hatine roja me.

Li Rojhilatê Kurdistanê, pêşengiya çanda dengbêjiyê bêhtirîn herêmên Makû, Mahabad, Xoy û Urmîyê kirine. Dengbêjên Rojhilatê Kurdistanê her çiqas di serdemê deshilatdariya rejîma Îslamiya Îranê de astengî, zor û zordariyên mezin dîtîbin jî heta îro rojê xebatên xwe bê navber domandine.

Dengbêj Brahîmê Newrozî an jî bi nasnavê xwe yê herêmî ku bi Xalê Birê tê naskirin, li gundê Conî ku girêdayî Urmîyê hatiye dinê. Derbarê sala jidayikbûna wî de mixabin tu agahiyek tune. Newrozî ji Êla Şikakî ye. Ev Êl jî Gola Urmîyê heta Şemdînan, Miks û Behdînanê belav bûne û bi cih bûne. Bi devoka Şikakî diaxivin. Şikakan zêdetir bi serok û rêberê Kurd Simkoyê Şikak ve tên naskirin. Simko bixwe jî ji eşîra Ewdoyî û ji Êla Şikakan e.

Bajarê Urmîyê dehemîn bajarê mezin yê Îranê ye. Nîfûsa wî bajarî xweşik gihîştîye nêzîkî 2 mîlyon kesî. Urmîyê bi gol û hilberîna xwêyê, bi jiyana xwezayî û dilgermiya

mirovên xwe navdar e. Gola Urmîyê li Rojhilatê Kurdistanê gola herî mezin e. Urmîyê di sala 1760'an de demek di bin serdestiya Kerîm Zend de dimîne. Kerîm Zend serokê dewleta Zend ya Kurd bû. Ji bilî Kurdan di herêmê de Ermen, Siryan û Azerî niştecih bûne.

Di sala 1969'an de li radyoya Urmîyê, Tehran û Kirmanşanê bi zaravayê Kurmancî her hefteyê nîv saetê carinan jî du saetan deşt bi weşanê dîkir. Bi damezrandina Radyoya Urmîyê Xalê Birê jî deşt bi xebatên xwe yên hûnerî dike. Li radyoyê bi Îran Xanim, Hamid Yusifî, Mîstafa Elîzade re klam û stranên curbicur dîstrî. Bi saya van camêrên hunerhez dengê Kurdan belav dibe hemû herêmê. Di radyoyê de stran û klamên her deverê Kurdistanê bi fermî dihate strandin û îcrakirin.

Brahîmê Newrozî jî mîna Îran Xanimê di bin bandora ekola dengbêjiya Serhedê de maye. Hûn klamên Newrozî guhdar bikin hûnê bibêjin qey ew dengbêjê Agirî an jî Wanê ye. Cure, terz, vegotin û lihevanîna klamên gotî mîna Serhedê ne.

Newrozî ne bi tenê dengbêjek bû belkî ew şoreşger û şervan jî bû. Di navbera salên 1979ê heta 1993an de di Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê de pêşmerge bû. Ji bo azadî û mafên Kurdan bi salan bi dil û can dixebitî. Newrozî jî wekî her Kurdekî di bin zext û zordariya rejîma Îranê de jiyaye. Di sala 1985an de ji ber sedemên siyasî neçar dimîne warê xwe bi cih bihêle û biçe Stenbolê. Lê sîxûrên Îranê pey wî bûn. Di êrîşeke nexêr de bi giranî birîndar dibe. Nêzîkî sê mehan li nexweşxaneyê Stenbolê tedawî dibe. Demeke dirêj ji ber birîndarbûna xwe nikare xebatên xwe yên dengbêjî û siyasî bidomîne.



Newrozî li Stenbolê çar kasetên sitranan tomar dike. Gotinên klam û stranên ku xwendine piranî her bi xwe danîne. Balkêş e ku li ser bajarê Stenbolê jî klamek gotiye. Eşkere ye derd û kulên wî bajarî jêre giran hatiye. Di klamên gotî de, dema mirov guhdarî dike, bêhna welat û eşqa axa Kurdistanê dikeve hundirê mirov.

Di sala 1993an de dewleta Îranê efûyê dide Newrozî û wê demê ew jî vedigere Rojhilatê Kurdistanê nava kesûkar û malbata xwe.

Gellek dengbêjên me mixabin heya îro rojê jî, bi belengazî û deşturtî jiyan dikin ku xalê Birê jî yêk ji wan bû. Hinek dengbêjên me nikarin tu karî jî bikin. Ez carinan xwe bi xwe dipirsim gelo Kurd çiqas neteweperst in gelo çiqas li çand û zimanê xwe xwedî derdikevin gelo çiqas Kurd in?

Birahîmê Newrozî heya dawîya jiyana xwe nêzîkî hezar klam û stran gotine 600 heb ji wan bixwe nivîsandine û tomar kirine. Di arşîva radyoya Urmîyê ya Beşa Kurdî de 300 heb klamên wî hatine weşandin. Newrozî behtirîn bi klamên xwe yên Delal, Îrane xweş Îrane, Mîrê Zirav, Bedewê, Lê Lê Zeriye, Eşqa Dilan, Keçika Canê û Hevalo tê naskirin.

Birahîmê Newrozî (Xalê Birê) di sala 2001ê de li gundê Coniyê jiyana xwe ji deşt da. Ji aliyê doşt û xizm û kesûkaran ve di nava girseyeke mezin de li gundê xwe tê binaxkirin.

We li vê dinyayê çî kiribe ev kirinên we ji civatê re dimîne. Dengbêj dimire şopa wî dimîne. Îro şopa Xalê Birê di jiyan û bîra me ya civakî de cih girtiye. Divê em qîmeta dengbêjên xwe bizanîbin. Kî ne çawa jiyane çî derd û elem kişandine, çî afirandine çî kirine? em bizanîbin. Ya herî cihê tirsê ew e ku ciwanên me yên nugihîştî dengbêjên xwe nas nekin û lê xwedî dernekevin.

Nerîna Lîderan



“Mike Pompeo”:
“Îran hêj jî rehîngirtinê berdewam dike”.



“Feysel Bin Ferhan”:
“Rejîma Îranê bingeha nearamî li Rohhilata Navîn û cîhanê ye”.



“Cemal Êmînkî”:
“Pêşmerge Herêma Kurdistanê diparêze ne PKK”.



“Eli Xamîneyî”:
“Her kes bibe serkomarê Amerîkayê li ser siyaseta me bandor nîne”.

Êdî Almaniya li hemberî Îslama Siyasî bêdeng namîne



N: Eskender Ceiferî

Roja 4ê meha Çiriya Pêşîn a sala 2020an jin û zilamek hevregezxwaz li navenda bajarê Dresdenê raştî êrîşê hatin ku di encamê de yek ji wan li nexweşxaneyê jiyana xwe ji deşt da. Ev kiryar û sedemên wê, beriya niha ji aliyê hêzên ewlehî û polîsan ve weke gefên îslametiye hatibûn binavkirin.

Roja 16ê Çiriya Pêşîn a 2020an mamosteyekî dîrokê ji aliyê îslamgîrek 18 salî ve li Conflans-Sainte-Honorine li bakurê rojavayê Parîsê hate kuştin. Ew ji ber nîşandana karîkatoreke Mihemed hate kuştin ku di kovara Charlie Hebdo de hatibû belavkirin. Wî mmamosteyî li ser mijara azadiya nerînan bi xwendekarên xwe re gotûbêj kiribû lê belê resmandina Mihemed ji dîtingeha şerîeta wan ve qedexe ye. Di encamê de jî bavê xwendekarekê û tundrewêk îslamgir Fetwata kuştina wî mamosteyî dan.

Roja 29ê Çiriya Pêşîn a sala 2020an 3 kes li kilîsayekê li Nizza hatin kuştin û 6 kes jî bi tundî hatin birîndarkirin. Tawanbar piştî ku hate girtin, hewara “Ellaho Ekber” hilda.

Mezintirîn rêkxistina sivîl ya Almanya ku wek Hevalbendên Çep tê naskirin, bi belavkirina daxuyaniyekê ragihand ku ew lidijî belavbû Îslama Siyasî ne û ew dixwazin rê li ber belavbûna Îslamê li wir bê girtin.

Wan di deştpeka daxuyaniya xwe de gotin ku em pir ditirsin ji ber ku xelk bi sedema hizrên nemirovane tene kuştin. Em aciz in ji ber ku ti rexneyek nayê girtin.

Jin û zilamek hevregezxwaz li Dresdenê raştî êrîşê tèn



lê belê ti kesek dengê xwe hilnade. Serê mamosteyekî li Fransayê tê jêkirin lê dîsa jî hemû bêdeng in. Êrîşek li Nizza bi kêr yan jî satorê hatiye kirin lê belê heya niha di derbarê wê de ti tiştek nehatiye gotin. Bêdengî heye ji ber ku rê nayê dayîn bi mafên kesên din bileyîzin. Em li vir dibêjin: Êdî bes e!

Hevalbendên Çep di beşeke din ji daxuyaniya xwe de gotin ku em naxwazin bêdeng bimînin û lewma jî bi awayekî eşkere dibêjin: Îslamgirî, li dijî mirovahiyê ye.

Kuştinên heftiya derbasbûyî jî, ji vê yasayê cuda nebûn. Ew jî bi armanca pêkanîn û bikaranîna tundrewiyê bûn ku ji aliyê hin kesan ve hatin encamdan û di encamê de hin kes, ji mafên xwe yên mirovahiyê tèn bêparkirin.

Di berdewamiya daxuyaniyê de daxwaz ji Almanyayê tê kirin ku ne pêşiya Îslamê, lê belê pêşiya tundgiriye bigire û dide xuyakirin ku divê li hemberî tevahiya wan kuştinan bi awayekî eşkere biaxivin ku bi hizrên tundrewane hatine encamdan: Ti bikujek, ji bikujekî din adiltir nîn e, ti qurbanî ji qurbaniyên din nêzîktir nîn in ji bo ku bibin armanc. Di-jatiya mirovahiyê, têrorîstên raştgir û bikujên îslamgir kirine hevalbend. Kereb û

kîn ji şariştaniyetê, azadî, dêmokrasî û mirovbûn. Qurbaniyên van raştiyan jî hebvgirtî dibin ku mafê sereke yê jiyana wan, ji wan hatiye şandin.

Xuya ye êdî Ewropî dixwazin bi rengekî cidî li hemberî têrorî derkevin.

Ew didin xuyakirin ku heke em bixwaze bi awayekî berdewam ji bo civakeke azad, ji bo mafên mirovan di asta cîhanê de û ji bo jiyaneke baş xebatê bikin, nabe bi ti awayekî li hemberî kuştina xelkê bê deng bimînin. Divê dengê xwe hildin û wek pêkhateyeke çepgir, nerazîtiya xwe nîşan bidin. Hekî bikuj îslamgir bin, divê em bikarin Îslamê rexne bikin.

Di beşa dawiyê ya daxuyaniya Hevalbendên Çep de hatiye, her kesê ku Îslamî be, têrorîst nîn e lê belê ew dixwazin pêşiya Îslama Siyasî û tundgiriye bê girtin û tekezê dikin ku hekî em bê deng bimînin, wê demê em nikarin îdiaya azadiya cîhanî bicî bikin. Em weke projeyeke dijberên faşîstan, bi rengekî eşkere li hemberî her cureyeke bêbextiyê, helwesta xwe nîşan didin. Herwisa bi qurbaniyan re û bi wan kesan re ku hizrên mirovkujiyê bandor kirine ser wan, hebvgirtî ne.

Kurd û Fransa



N: Ebdulazîz Qasim

Piştî peymanê “Sykes-Picot”, beşek ji Kurdiştanê ket di bin deşthilata “Mandate” Fransîyan de (1920-1946), ya îro jê re tê gotin Kurdiştana Sûriyê “Rojavayê kurdiştanê”, Fransa di dema “mandate” de gelek piştgirî da kêmaniyên netewî, olî û mezhebî li Sûriyê, û Sûriya niha li ser pênc dewletan dabeş kiribû (Heleb, Şam, Çiyayê Elewîyan, Çiyayê Dirziyan”, û dewleta “Sinceqa Eskenderonê” ku ji sala 1939’an ve di bin dagîrkeriya Tirkîye de bû, ku piraniya kurdiştanê di nav Sinceqa Eskenderon û dewleta Helebê de bû.

Di sala 1920’an de bi fermana jêneral “Henri Joseph Eugène Gouraud” (1867-1946), wîleyeta Cizîrê hat damezrandin ku piraniya wê Kurd û Xirîştîyan bûn ya niha bi navê (parêzgeha Hesekê) tê naskirin, ku Fransa piştgiriya bi şatukirina deverên kurdî dikir, berevajî Mandata Brîtanyan li Îraqê ya ku dijminatîya gelê kurdî dikir û li gorî peymanê 1926 wîlayeta Mûsil ya bi piranî Kurd tevî Îraqê kir.

Wîleyeta Cizîrê “parêzgeha Hesekê” ji aliyê darayî û rêveberî ve şatuyek serbixwe bû, ji aliyê din Fransa rolek mezin hebû di weşandina kovar û edebiyatên kurdî de û dibîştan bi zimanê kurdî hatin vekirin, û ji bo pêvajoyê piştgirîkirina kurdan bi rêya hin rojhilatnasên xwe û bi taybetî rojhilatnas Roger Lesco (1914-1975), ku rolek wî ya mezin hebû digel zimanzanê Kurd Mîr Celadet Bedirxan ji bo bi latînkirina zimanê kurdî û latînkirina zimanê kurdî bi diyardeyek pêşketî û şarîştanî

nirxand.

Li pêş deştpêkirina duyem şerê cîhanê (1939-1945), ji aliyê hin serok eşîret û rûspiyên Kurdan ve daxwaza serxwebûna eyalata Cizîrê hate kirin û ev daxwaz ji aliyê rayedarên Fransî ve hate pejirandin û daxwaz ji kurdên Cizîrê kirin ku têkiliyan digel kurdên Helebê û xirîştîyanên deverê “bi taybetî digel Siryanan” bikin ji bo avakirina dewleteke kurdî wekî dewleta Libnanê ku serok Kurd be û serokwezîr Siryanî be, lê ev proje sernekevt ji ber tînebûna rêxistêke netewî ya kurdî ya bi rêkûpêk û herwiha nakokiyên di navbera rûspiyên kurdan de, tevî dijayetî û nerazîbûna netewperîstên Erebbi taybetî Partiya Komunişt ya Sûrî ku bi hevkarîya dewleta Tirkîyê ya ku gilînameyek li ser vê yekê ji bo “League of Nations” pêşkêş kir û bi alîkarîya hin dewletên din ev proje hate jinavbirin, û Gelê kurd derfeteke zêrîn bi derketina Fransa ji Sûriya di sala 1947’an de jideşt xwe da.

Fransa, bi deştpêkirina krîza Sûriyê ya berdewam ji sala 2011-an ve, careke din xebata xwe ya ji bo paraştina kêmatiyên netewî û olî berdewam kir, û bi tundî li hember dagîrkariya Tirkîyê li ser Efrînê û Girêspî û Serêkaniyê helwestê şandin, û ev yek bû sedemeke mezin ji bo peydabûna nakokiyên mezin di navbera wê û Tirkîyê de, ku îro roleke wî ya mezin heye digel Hikûmeta Herêma Kurdiştanê û Amerîka ji bo lihevhatina kurdî-kurdî ya di navbera ENKS û PYNK de.



Mamoşa Hecî Mela Ebdulqadir Bêzawî, pêşnimêjê Sunnîmezheb yê Urmîyê koça dawî kir

Danê sibeşûya îro Pêncşemiyê 5ê Çirriya paşîn, piştî çend rojan ber-ekanî di gel vîrûsa koronayê, di nexweşxaneyekî Urmîyê de çu ber dîlovaniya xudê.

Mamoşa Bêzawî alimê payebilinde Urmîyê, sala 1312ê li gundê Noşanê ji dayîk bibû.

Wi her di temenê zarokîniya xwe ve deşt kire perwerda Olî û di hîcre û Xaniqaya Birhanê, bal xalê xwe Mamoşa Abid Şemsedîn xwend. Piştî bo asata bilinde xwendinê diçe başûra Kurdistanê.

Dema ku mamoşa Bêzawî îcaza melatîyê wergirt, di wan gundane de mamoştayetî kirî ye, weke Noşan, Sêro, Cohnî, Benda Urmîyê, û kesayetiya bilinde wî bo hemî kesê di hemî nawçên Urmîyê de hate naskirin, û bibû cihê hitbar û xoşvaniya hemî kesê, her lewma jî bû îmam cum'eyê kite mizgevtê ehlê Sunnî di nava bazara Urmîyê û xelkê weke mamoşa û alîmekî mezin mêze dikir.

Zêdebarî hebûna koronayê, bi beşdariya sedan kes ji hejkeriyên Mamoşa, rêûresma bi axê sipartina wî, di gundê Noşanê de birêve çu.



PDKÎ sersaxiyê dide malbat û kesûkarê mamoşa Bêzawî û hemî xelkê Urmîyê û xwe hevxema wan dizane.

Tirajêdiya kolberan bêdawî ye

Dîsan roja Duşemî 12ê Xezelwerê (3ê Çirriya Paşîn), kolberekî Kurd yê bi navê “Eyûb HUSÊNÎ” kurê Eta xelkê bajarê “Banê” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên rejîma Îranê li ser sînorê “Hengejal” yê wî bajarî hate birîndarkirin.

Ev kolberê Kurd digel deştêyek ji kolberan bi bê agehdarkirina berê raştî teqeya hêzên leşkerî yên rejîma Îranê hatin.

Ew kolbere bo çareserîya pîzîşkî bo navenda dermanî



ya bajarê Banê hate veguhaştin.

Her di vê derheqê de, roja Duşemî 12ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Siyawêş Kuresonî” xelkê gundê “Rawyan” yê ser bi beşa Kotol a Xoyê li encama teqeya hêzên leşkerî yên rejîma dagîrker li ser sînorê wî bajarî canê xwe ji deşt da.

Di girtîgeha Sinê de givaşê dixine ser girtiyên siyasî

Di girtîgeha bajarê Sinê de, karbideştên wê girtîgehê givaşê dixine ser girtiyên siyasî û şerê derûnî bo wan çê dîkin.

Li gorî zanyariyên giheştine Nûçegihaniya “Kurdiştan-media” yê, Cebat Nîknefis, birêveberê navxwe ê girtîgeha Sinê, givaşê bo girtiyên siyasî tîne û şerê rewani bo girtiyan çê dîkin.

Ev karbideştê rejîmê di girtîgeha Sinê de bi awayekî sistematîk givaşê dixine ser girtiyên siyasî û rewşa ne hêminiyê bo girtiyan afi-



randiye.

Di girtîgeha Sinê de hejmareke zêde girtiyên siyasî hene ku karbideştên rejîmê wekî eşkence, givaşa ruhî û rewani bo wan girtiyan tînin.

Berpîrsên wê girtîgehê ti bersîveke wiha nedane girtiyan û belkî pîraniya caran jî bi bê hurmetî bersîva girtiyan dane.

Girtîgeha navendî a Sinê hejmarekî berçav girtî, bi taybet girtiyên siyasî û Olî li xwe ve digre, û ji 10 bendên sereke pêk hatiye.

Şahê dengbêjan Şakiro

Gelek sedemên zindî-mayîna zimanan hene. Ji ber ku perwerdehî tunebûye û nivîsên Kurdî jî kêr bûne, ya ku zimanê Kurdî û dîroka Kurdan paraştîye ,dengbêjî ye.

Di tunebûna weşan, çape-menî, radyo û televîzyonan de kilam, lorik, çîrok û...hwd zimanê me zindî hiştine. Dengbêjan di dema xwe de ew derdên bédengiyê, bi dengê xwe gihandine pîraniya civakê û bi wî awayî bûne berdevkê dil û derûniya mexdûrên bédengan. Mirov dikare bi wê yekê bawer bike ku çawa dengbêjan di rojên kêf û şahiyê de aramî û asûdeyî dane civakê, wan di rojên dijwar û şînê de jî keser û kedera dilê civakê jî bi sewta xwe ya aram, hêdî û kêr kiriye. Dibe ku ji ber vê egerê be ku civakê di nav xwe de ew çend qedir û rûmet daye wan.

Dengbêj wek kesên ku şiklekê dide deng, kesê ku deng dibêje pênase dike. Dengbêj ew kes e ku ruhekê dide deng û wê jîndar dike, dengbêj deng dike kelam û kelamê jî dike kilam.

Dengbêj hunermendên gel û hozan in ku civaka xwe bi kevneşopî û edetên wê bi her awayî dinasin û wan pêşkêşê endamên heman civakê dikin. Ew qala bûyerên civakî yên wek şerên navbera eşîran, bûyerên dîrokî, bûyerên surûştî yên wek erdhej û şewatê, qala evîndaran, kul û keserên evînê dikin. Ew li gor herêma xwe bi amûr an jî bîyî amûr hunera xwe pêşkêş dikin.

Yek ji wan dengbêjan jî ku xweşî û nexweşî, evîndarî û dildarî, pend û şîret û gelek tiştên din bexşîye bi civatgeha xwe, ev jî şahê dengbêjan, Şakiro ye.

Şakiro di sala 1936an de li Eleşgirta Agiriyê hatiyê dinê û pîrrianiya jiyana xwe di koçberiyê de borandiye. Malbata Şakiro jî gundê Eleşgirtê diçe gundê Cemalverdi ya Dûtaxê bi cih dibe û Şakiro jî li wî gundî ku bi cih bûne



zarokatiya xwe derbas kiriye. Di wan deman de li gundê Cemalverdiyê kesek bi navê “Bedihê Kor” an jî “Bedihê Hemîd” ku dengbêjekî binavûdeng bûye. Bedihê şagirtê Evdalê Zeynikê bû.

Şakiro jî di temeneke pûçik de dibe şagirtê Bedihê û li cem wî dengbêjiyê hîn dibe. Piştî malbata wî di sala 1950î de ji wir jî koç dikin berê xwe didin ber bi Qereyaziyê ve.

Piştî 9 salan bavê Şakiro ji Qereyazê sirgûnê Edeneyê dikin li wir jî derdorê 7 salan dimînin û di sala 1966an de vedigerine Mûşê û di heman salê de berê xwe didine Qereyaziya Erzeromê.

Şakiro di jiyana xwe de qet neçûye dibistanê. Di zarokatiya xwe de dest bi kilamgotinê dike. Di xortaniya xwe de Dengbêjên Serhedê yên wek Reso û Ferzê nas dike. Bi wan re di nav civatan de kilaman dibêje. Birayê Şakiro, “Seid Denîz” hevnasbûna Şakiro û Ferzê wiha tîne ziman: “Şakir di dawetekê de bi dengbêj Ferzê re kilaman dibêje. Lê Şakir nizane ku ew dengbêj Ferzê ye, piştî ewê ku Ferzê li Şakir guhdar dike û jêre dibêje ku ez dengbêj Ferzê me heta niha ti kesî nikarîbû bi min re ştranan bibêje. Hege tu miqayetê xwe bî tu dê bibî dengbêjekî baş”.

Şakiro hêj di zarokatiya xwe de bi dengbêjiyê re hevnas dibe û di nav zevîya dengbêjiyê de tovekî binecih direşîne. Bi reşandina vî tovî re her ku diçe di nav gel de binavûdeng dibe.

Bandora xwe heta niha jî her hebûye, di her malekî Kur-

dan de kêr û zêde kasedên wî hene. Ew bi dengê xwe, bi zanişta xwe û bi hişê xwe yê kollektîf bûye berdevkê civata xwe.

Di her kilameke wî de dîroka Kurdan, civata Kurdan, bîr û baweriyên Kurdan, kevneşopiyên Kurdan û Jiyana Kurdan cih digre.

Şakiro jî ber dengxweşî û awazê xwe yê xweş û bilind, di nav gel de çend navên ku bi dengê wî re têkildar in ji wî re hatiye gotin. Ji ber ku demekê li Qereyaziya Erzeromê jiyana xwe borandiye jêre “Şakirê Qereyazî” hatiye gotin herwiha pîr kes wî wek kesekî ji Qereyaziyê dinasin.

Naveke din ê ku di nav gel de lêhatiye kirin jî “Şahê Dengbêjan” e ji ber payebilindiya deng û xweşawaziya wî ye. Li hêla din, ji ber xweşbûna dengê wî û hoştatiya wî ya di xulxulandinê de wek Kewê Ribat hatiye binavkirin. Kewê Ribat ew kew e ku nêr e û dema di nav refa kewan de qebeqebê dike, dengê wî bi ser ên dinê dikeve. Ew kewê ribat, weke ku ji bona derbashbûyî û paşerojekê ştrana û kilamên kurdan de xwediyê dewlemendiyeke kûr û bihêz bû, di hunera kurdan a klasîk de jî berekî bingeîn ê nexşîn bû.”

Şahê Dengbêjan di sala 1988an berê xwe û malbata xwe dide xerîbistanê. Vê carê ji axa Kurdan bi tevahî dûr dikeve û bi malbatê ve diçine rojavayê Tirkiyê.

Şakiro êdî ji Kurdiştana xwe dûr dikeve û diçe welatekî din. Heta dawîya temenê xwe li wir derbas kiriye.

Wek hemû dengbêjên din ên Kurdan, wî jî jiyana xwe di nav êş, keser û herjariyê de borandiye. Di sala 1996an li Îzmîrê koça dawiyê dike. Şakiro bi kilamên wek “Gulê Dêran, Şerê Mala Nasir, Eliyê Purto, Nêçîrvano, Geliyê Zîlan, Esmer, Sebrê û Wey Dil” navdar e. Şahê

dengbêjan an bi navê xwe yê din Kewê Ribat bi van kilaman di nav civatê de û di nav Kurdiştanê de êdî hêdî hêdî navê xwe û cihê xwe dîyarî dike.

Navdariya wî her ku diçe di nav xelkê de belav dibe, ew êdî di nav civatê de cihê xwe digre. Bêguman di nav hemû Dengbêjên Kurdan de cihê wî diyar e ji ber ku hem bandor li ser dengbêjên piştî xwe hebûye, hem jî di hemû malan de kasedeke wî cihê xwe girtiye.

Dema mirov kilamên Şakiro bi baldarî guhdar dike ku ev yek di hemû sitranan de jî berçav e mirov dibîne ku Şakiro ti caran di kilameke xwe de amûrekî mûzîkê bi kar neaniye. Wî dengê xwe yê bilind û zelal ji xwe re wek amûrekê bi kar aniye. Şakiro bi dengê xwe yê xweş ruhekî dide guhdarê xwe ku bi awayên baş herine nav kûrahiya kilamên wî.

Hinek ştrana bi dengbêjan pênase bûne. Gelo kilama “Fîlîte Quto û Memê Alan” ji Reso xweştir kî dibêje? Bêguman dema ku Şakiro dibêje meriv bi tevavî diçe di nav kûrahiya sitranê de. Şakiro dema ku ştrana kekê Xiyasêdîn dibêje dîroka tejiyê û keser tîne bira mirov û di wê ştranê de basa serhildana Şêx Seîd dike û çawa ji aliyê dagîrker ve hatine tepesrkirin.

Dengê Şakiro dengê çiyayî ye û dengê bilind e û dengê wî ne tenê di odeyan de tê bihîstin belkî dengê wî di nav çiya û deverên Kurdiştanê de wekî dengê kewan ku dixwîne wisa ye û çend deng û rengan dide.

Dengbêj Şakiro bi ştranên xwe hem çanda vegotina devkî li ser pêyan hêştîye û gihandîye nîfşa niha, hem jî di wêjeya geleri de cihekî bi taybet ji xwe re veqetandiye. Şakiro sedan ştrana gotine û di kevneşopîya dengbêjiya kurdan de cihekî grîng girtiye.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Du welatîyên xelkê bajarê Şinoyê bi hepsê hatine cezadan

Du welatîyên Kurd yên bi navên “Rehîm Ref`etî” kurê Mihemed û “Rehman Tabîş” kurê Murad xelkê bajarê şinoyê, ji aliyê dadgeha şoreş a wî bajarî ve bi seroketîya dadver “Rezayî” bi hepsê hatine cezadanê.

Ligor wê biryarê, ew du welatîyên Kurd her yek ji wan bi tohmata “endambûn digel yek ji Partiyên Kurd yên dijberî hîkûmeta Îranê û tebanî dijî nîzamê” bi 3 sal û 7 meh heps û bi tohmata “Peywendî digel yek ji Partiyên Kurdî” bi 8 sal heps hatine cezadan.

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, cezayê ku bi ser wan du welatîyan hetîye sepandin bi wan re hatiye ragihandin. Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, ji gor yasayên komkirî, cezaya eşed bo wan du welatîyên Kurd dibê bê cîbicîkirinê. Ew du welatîyên Kurd, roja Yekşemî 15`ê Pûşperê, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî bi tohmata “alîkarîkirin digel yek ji Partiyên Kurdî” ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin û bo lêkolînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yên bajarê Urmiyê hatibûne veguhaştin.

Meha Rezberê, ew du welatîyên Kurd piştî dawî pê hatina heyama lêkolînê, bi danîna barimteyê bi awayekî demkî di girtîgehê de hatibûne serbestkirin.

Du kolber li sînorê Urmiyê bi teqeya hêzên Artêşa Tirkîyê hatine kuştin û birîndarkirin

Roja Şemî 10`ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Muhsin (Muslim) Qasimî” temen 24 salî, bi sedema teqeya hêzên Artêşa Tirkîyê li ser sînorê Urmiyê canê xwe ji dest da û kolberek din yê bi navê “Muslih Qasimî” temen 21 salî, bi dijwarî hate birîndarkirin.

Hêzên Artêşa Tirkîyê ew du kolberane bi bê berçavgirtina yasayan, teqe ji wan kolberane kirine û di encam de Muslih Qasimî hate birîndarkirin û niha di nexweşxaneyê “Colemêrg” ê girêdayê parêzgeha “Hekariy”yê a Bakurê Kurdistanê li jêr çavdêriya pîzîşkî de ye.

Ew du kolberane ku birayên hew in, piştî vegerîn ji Bakurê Kurdistanê bo Rojhelata Kurdistanê raştî gullereşandina rasteraşt a hêzên Artêşa Tirkîyê hatine.

Ew du kolberane kurên Ebdullah û xelkê gundê “Koran” ê girêdayê devera Soma û biradoşt a bajarê Urmiyê ne.

Kolberekî Kurd li ser sînorê Baneyê hate birîndarkirin

Roja Duşemî 12ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Eyûb HUsênî” kurê Eta xelkê bajarê “Banê” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê “Hengejal” yê wî bajarî hate birîndarkirin.

Ev kolber digel desteyek ji kolberan bi bê agehdarkirina berê raştî teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hatin. Ew kolbere bo çareserîya pîzîşkî bo navenda dermanî ya bajarê Banê hate veguhaştin.

Roja Duşemî 12ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Siyawêş Kuresonî” xelkê gundê “Rawyan” yê ser bi beşa Kotol a Xoyê di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê de li ser sînorê wî bajarî canê xwe ji dest da.

Kolberekî Kurd bi teqeya hêzên leşkerî li ser sînorê bajarê “Xoy”ê canê xwe ji dest da

Roja Duşemî 12ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Siyawêş Kuresonî” xelkê gundê “Rawyan” yê ser bi beşa Kotol a Xoyê di encama teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li ser sînorê wî bajarî canê xwe ji dest da.

Hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê bi bê agehdarkirina berê bi awayekî rasteraşt teqe li wî kolberî kirine. Ew kolber bi bê hebûna barê qaçax raştî gullereşandina hêzên leşkerî hat.

Di vê derheqê de êvara roja Yekşemî 11ê Xezelwerê, kolberekî Kurd yê bi nave “Luqman Rehîmî” xelkê bajaroka “Banewrê” ya ser bi bajarê “Pawê”yê bi sedema teqîna mînê li ser sînorê “Şûsmê” bi dijwarî birîndar û kêmandam bû.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (385)

Wêneyên mamoste Celal Melekşa

